

T ê k o ş e r

Hejmar 43

Adar 1989



Têkoşer : Kovara Têkoşer, yekitiya Karker û Xwendekarên Kurd li Beljika
 Navnîşan : rue Bonneels, 4 - 1030 Bruxelles
 Navnîşana Postê : B. P. 33 - Zellik
 Tel : 02/230.89.30
 Buha : 50 F.B.
 NO bankê : 426-3144071-85 - K.B. - Belgique
 Bêrpirsiyar : M. Nezhî Yalçîn
 Komîta nivîskariyê : Derwêş, Nezhî, Pervîn

N a v e r o k

Siyaseta nijadkujiyê li Kurdistanê	Derwêş	3
Hikûmeta Beljîk alikari dişîne Kurdistanê	Derwêş	4
Deklarasyona Konferansa Stockholmê		5
Bijjîkên Bê Sinor li Kurdistanê	Dr Pierre Harzé	6
Kurd di têkoşîna duhu û sibe de	Şahînê B. Sorekli	9
Şaşî : Nedi û Danestan (Ş. B. Sorekli)		13
Dirola Kurdistanê di Ansiklopêdiya Islamê de (XVI), Zargotin û bêje (2)		14
Rêzimana kurdi (XVI), Pronavê kesin	Celadet Bedir Xan û Roger Lescot	21
Helbest : Helebçe	Amed	24
Xebata me		26

S o m m a i r e

Politique de génocide au Kurdistan	Derwêch	3
Le gouvernement belge envoie de l'aide au Kurdistan	Derwêch	4
Déclaration de la Conférence de Stockholm		5
Médecins Sans Frontières au Kurdistan	Dr Pierre Harzé	6
Les Kurdes dans la lutte d'hier et d'aujourd'hui	Chahîn B. Sorekli	9
Erreur : conte de Nedi et Danestan (Ch. B. Sorekli)		13
Histoire du Kurdistan dans l'Encyclopédie de l'Islam (XVI), Folklore et littérature (2)		14
Grammaire kurde (XVI), Le pronom personnel	Dj. Bedir Khan et R. Lescot	21
Poème : Halabdja	Amed	24
Nos activités trimestrielles		26

I n h o u d

Beleid met volkerenmoord in Koerdistan	Derwêch	3
De Belgische regering stuurt hulp naar Koerdistan	Derwêch	4
Verklaring van de Conferentie te Stockholm		5
Artsen Zonder Grenzen in Koerdistan	Dr Pierre Harzé	6
De Koerden in hun strijd, gisteren en vandaag	Chahîn B. Sorekli	9
Vergissing : Het verhaal van Nedi en Danestan (Chahîn B. Sorekli)		13
De geschiedenis van Koerdistan in de Encyclopedie van de Islam (XVI), Folklore en Literatuur (2)		14
Koerdische spraakkunst (XVI), Het persoonlijk voornaamwoord	Dj. B. Xan en R. L.	21
Gedicht : Halabdja	Amed	24
Onze driemaandelijke activiteiten		26

Siyaseta nijadkujiyê li Kurdistanê

Dêrwês

Gelê me di bin rewşeke dijwar de diji. Li Kurdistana bakur (T) zor û êşkence bi awaki dijwar tê kirin. Ev zor û êşkence herweha li penahendên Kurdên ku ji ber nijadkujiya Iraqê revîne ji dibe. Rejîma Iraqê, Baas, siyaseta xwe a dijwar di hember Kurda de hê ji berdewam dike.

Zor û êşkencên li Kurdistana bakur di vê dema dawî de ji qalibê xwe derket û ne tenê di rojnamên Tirkî de, lê li Ewropa ji bala rojnaman û televizyon û radyoyan kişand.

Li derdorê Sêrtê seyên beredayî hestiyên merivên ku ji aliyê leşkerê Tirk bi koman hatine kuştin û veşartin derxistin. Ev qetliam ji aliyê Atilla Durak, serêkê SHP li Sêrtê ji hate gotin.

Li bajarê Cizirê, gundê Yeşilyurt (navê Kurdi nizanîm, bibexişin), serbazê leşkerê Tirk Binbaşî Tayyar Caglayan, bi zorê gû bi gundiyan da xwarin.

Hans Gôran Frank, yek ji koma Parlementerên Danimarkî, berî çend mehan çûbû Tirkîyê û Kurdistanê. Li Kurdistanê, wî li rewşa penahendên Kurd ên di kampan de nêri û ji rewşa wan re "zindanan vekirî" got.

Kurdên ku revîne Kurdistana bakur hêvi dikirin ku zarok, jin û pirên xwe ji bombên kimyayî biparêzin, xwe avêtin bextê dewleta Tirk û Iranê. Li aliyê Tirkîyê, li Kurdistan, bi hatina xwe poşman bûn û gelek ji wan berepaş veşeriyên û ji xwe re li parêzêke din geriyên. Yê ku li nav "sinorên dewleta Tirk" man di rewşeke xirab de ne. Dêrdê birçibûn, paqijî, nexweşî û mirinê giran bû. Ew di nav felaketê de dijin. Cidayî pir û jinên nexweş, 500 zarok nexweş in û bi mirinê re şerr dikin. Ta niha ji 130 zarok mirine. Yek ji nûnerên Kurdên kampan, Ekrem Mayî, li ser vê yekê weha dibêje: "Ber deriyê çadira bijijk (doktor) tijî meriv e. Nexweş pîr in lê bijijk du kes in. Du kes bo me, 15.000 kesan, karin çî bikin? Di vê zivistanê dijwar de daran nadin me. Elektrik hatiye birrin, av nîne û leşkerê Tirk ji nahêle ku em bixwe ji dêrdê xwe re li çarêyekê bigerin. Deriyên kampan kilit in, dora me bi têlorgî û leşkerê Tirk girtî ye. Em ne di kampan de, lê di zindaneke vekirî de ne".

Berî çend mehan, Ibrahim Aksoy, Parlementerê Kurd ê Meletyê (ji partiya SHP), li civîneke Parlemeta Ewropa pêşneyara xwe di derbareyî pirsê Kurda de got. Pêşneyara wî ev bû: "divê ku mafên Kurdan ên bingehîn li Tirkîyê bêne qebûl kirin". Ev gotinên wî wek brûskê li Tirkîyê belav bûn. Berî ku dewlet û generalên Tirk dest bavêjin vê pirsê, partiya wî bixwe, SHP, ku xwedî giravî "sosyal demokrat e, ew di nav xwe de mehkeme kir û ji partiyê bo du salan derxist. Bi vê yekê "sosyal demokratên tirk" disa dan xuya kirin ku ew di derbareyî pirsê Kurda de bi qasî mûyekî ji ji dewlet, parlemant û generalên xwe ferq nabin.

Ibrahim Aksoy, di hevpeyvînekê bi rojname Hurriyet re de, ewha got: "Eger parlementerêk nikaribe ditinên xwe bi awakî vekirî bêje, di nav partiya xwe de tuşî zimangirtinê bibe û ji aliyê dewletê bê tehqîb kirin, kes nikare ne di wê partiyê de û ne ji di wê dewletê de ji demokrasîyê qal bike. Kurd hene û kes nikare vê rastiyê inkar bike. Roj bi kilsê nayê sîwa kirin. Hin "ronakbîr" mesela Kurda wek nexweşiyekê, wek kolêra dibinin. Ez ji van merivan re ne "ronakbîr" lê merivên nexweş dibêjim".

Hikûmeta Beljîk alikari dişîne Kurdistanê

Derwêş

Wezîrê Flaman, André Geens, proja Navenda Navnetewî a Flaman û Têkoşer, di derbareyî penahendên (multecî) Kurd li Kurdistanê de qebûl kir. Wezareta Beljîkî a Alikariya Pêşveçûnê (Ministerie van Ontwikkelingssamenwerking) bi awakî resmî alikariya 2.000.000 frankên beljîkî qebûl kir.

Ji salan û vir de, gelê Kurd li Kurdistana jêr (Irak) bi çekên kimyewî tê qirkirin. Bajarê Halabce, berî niha bi salekê ji aliyê rejîma faşîst hate bombekirin. 5000 kes hatin kuştin, zêdeyî 12000 kes birîndar bûn û zêdetirî 100.000 kes ji hem ji Halabce, hem ji jî derdorê, ber bi sinorên nêz revîn. Bi vê bûyera dilşewat Halabce ji di dîrokê de cihê xwe digre.

Rojên pey nijadkujiya Halabce, radyo, televizyon û rojnamên cihanê nûçe li pey nûçe ji Kurdistan didan. Xuyayê ku ji bo ku nûçe li ser Kurdan bîn weşandin, kuştin û êşkence li ser wan pêwîst e !

Lê ev nûçe paş demekê qediyar. Meriv dibêje ku Kurd ne li vê cihanê lê li cihanêke din dijîn û haya tu kesî ji wan nîne. Lê ji aliyê Kurdan em nikarin vê yekê bêjin. Kurd hem li Kurdistanê û hem li derveyî welêt ewê Halabce jindar bikin. Ewê nijadkujiya Halabce her sal nalet bikin.

Li hemî welatên Ewropa xebata alikariya penahendên Kurd li Kurdistanê çêbû. Li Beljîk jî, paş xebateke dûr û dirêj, alikariyêke diravî hat qebûlkirin. Bi vî diravî ewê beşekî nexweşxanekê li ser sinorê di navbera Kurdistana jêr (Irak) û Kurdistana rojhilat (Iran) de û cihê dibistanekê ji bo zarokên penahendan bîn ava kirin.

Ev proje û qebûlkirina wê ji aliyê Têkoşer, Navenda Navnetewî a Flaman (V.I.C.) û endamê Parlemanta Ewropa, dost û hevalê Kurda Willy Kuypers di 8.3.89 de, bi riya civîneke çapê hate îlan kirin. Ev civîna çapê a yekem e ku li Têkoşer bixwe çê dibe. Rojnamevan, nûnerên komelên giring û nûnerên Parlemanta Ewropa û Beljîka beşdari wê bûn.

Televizyona flamanî BRT di 17 Adar de 15 deqîqa li ser vê civîna çapê û rewşa Kurda bernamêkê weşand. Eynî bernamê ji aliyê radyoya flamanî jî hat weşandin. Gelek rojnameyên flamanî jî li ser wê nivîsî.

c/o Kurdiska Riksförbundet

Box: 45205, 104 30 Stockholm/Sweden

Tel: 08/ 668 60 60

Deklerasyona Konferansa Stokholmê

Bi serpereştîya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê ji 8 welatên Ewrûpayê 9 rêxistinên demokratîk yên kurdan di rojên 13-14-15.01.1989'an de ji bo cara yekem li Stokholmê li ser pirs û problemên jêrîn hatin ba hev:

- 1) Sedemê hatina kurdan bo Ewrûpayê;
- 2) Rewşa karker, penaber, jin, zarok û ciwanên kurd li Ewrûpayê;
- 3) Rewşa çapemenî û kultura kurdî li Ewrûpayê;
- 4) Li Ewrûpayê rewşa rêxistinên demokratîk yên kurdan û pirs û pirsgerêkên hevkarîya di navbera wan de.

Ji Swêdê bi navê Wezîrê Bîyanîyan û Wezareta Kar Lars Gunnar Eriksson, bi navê "Svenska Kommitten för Kurdernas Rättigheter" (Komîta Swêdî ji bo Mafên Kurdan) û "Rädda Barnen" (Rêxistina Parastina Zarokan) Tomas Hammarberg, parlamenterê Partîya Sosyaldemokrat Hans Göran Frank, seroka "Invandrarverket" (Daîra Bîyanîyan) Christina Rogestam û nunerên partiyên siyasî yên swêdî beşdarî Konferansê bûn. Nunerê Partîya Sosyaldemokrat, silav û daxwazên serketinê yên serokwezîrê Swêdê Ingvar Carlsson gihand Konferansê.

Tev beşdaran piştgirîya xwe bo Konferansê û têkoşîna gelê kurd xuya kirin.

Di dawîya Konferansê de ji bo çareserkirina problemên kurdên li Ewrûpayê, ev biryar hatin girtin:

- 1) Ji bo danûstandinê, bi navê "Komîta Konferansa Kurd-Stokholm" komîteyek hat avakirin.
- 2) Ji bo xurtkirin û berdewamiya hevkarîya di navbera rêxistinên de biryar hat girtin.
- 3) Ji bo çareserkirina problemên kurdên li Ewrûpayê wê salê carekê konferansek bicive.
- 4) Konferans piştgirîya xwe bo tevgera rizgarîxwaz ya li her çar parçên Kurdistanê, diyar dike.
- 5) Konferans piştgirîya xwe bo berxwedanên girtiyên kurd diyar dike.
- 6) Konferans ji alî Îraqê ve qirkirina gelê kurd bi çekên kîmyayî bi tundî protesto dike.
- 7) Konferans politîka muhacirkirina gelê kurd protesto dike.
- 8) Konferans bala dengê giştî yê cihanî dikşîne ser neheqîya li ser kurdên Li Elmanya Federal û li Hollandayê dijîn, ku li van welatan hebûna kurdan wek grûbek netewî û serbixwe nayê nasîn û kurd ji piraniya mafên ku bîyanîyên din hene, bêpar in.

Rêxistinên ku beşdarî Konferansa Stokholmê bûne:

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê; Malbenda Rewşenbiriya Kurdî - Engilistan; Enstîtuya Kurd li Parisê; Federasyona Komelên Karkerên Demokratên Kurdistan (KKDK) - Elmanya Federal; Têkoşer - Belçika; Nevendîya Kurdistan - Arnhem/Hollanda; Komela Kurd li Arrhus - Danîmarka; Akademiya Kurd li Elmaya Federal; U.K.S.Y.E - Berlîna Rojava

Bijîkên Bê Sînor li Kurdistanê

Dr Pierre Harzé

Pêşgotina Têkoşer

Rêxistina serbixwe ya beljîki "Médecins sans Frontières" yan "Arts Zonder Grenzen", ango Bijîkên (doktor) Bê Sînor di kovara xwe ya lîon 88 de gotareke dirêj ku ji çar rûpelan pêk hatiye li ser Kurdistanê nivîsi.

Ji bo ku me vê nivîsê gelek hêja dit, em beşeke wê ya mezin wêrdigerînin kurdi. Piştî pêşgotineke dirêj li ser dîroka Kurdistanê ya kevn û nuh, tevî nexşe û wêneyên cihê, Dr Pierre Harzé ewha dibêje :

Dewlemendi

Eger ev alî, ji sedema şerr, li paşiya meydanê hatibe histin jî, bê guman Kurdistan navçeyê gelek dewlemend e, ji aliyê tebîî, çandî û aborî.

Tebîet hergav mêvanan heyran dihêle. Xweşikbûna çiyayên wê yên birûmet û hov weka wê tu neye. Em şaş nebin gava ku hin dibêjin ku Bihişt (cennet) cihanê di vê beşa goma Dicle û Firatê de ye.


Ev navçe gelek dewlemendiyên wê yên aborî hene.

Weka ku me li jor got, xezineyên petrola Kurdistanê yek ji sedemên sêrêke yên perçêkirina wê bû. Lê di zewî (erd) de maddeyên din ên xam ku dikarin bîn derxistin jî hene. Zewî nemaze di navçeyên zirai de gelek şin e. Sedema vê yekê iklimê wê ye xweş û kartêkirina (tesîr) baş ya Dicle û Firatê ye. Navçeyên Kurdistanê yên ku ji aliyê aborî balkêş in ji aliyê welatên ku perçêkê ji wan stendine tîn bi kar anîn. Gelek niştimanperwerên kurd hergav bala me dikişînin ku eger ew karibin hemî navçeyan ji nuh de yek bikin, ewê hemî mercên (şert) pêşveçûneke

aborî bigihêjin hevdu.

Candêke serbixwe

Cand dewlemendiyêke ku nîrxê (qîmet) wê ji aliyê mantiqî bi zorê tê pîvan e. Ew nayê bazar kirin, lê dinamizma gelekî bixwe pêşan dide. Meriv pîcar dibihise ku welatêkî bê çand tu jîndariya wî tu neye. Eger ewha be, Kurdistan bi jîndari û dinamizmê difûre. Her beş ji jîna civakî adetên wê hene, weka pêmahiyên (tradîsyon) gelek hûr ên zewacê. Dawet hergav roja lîne çêdibin, ji bo ku ev roj weka ya



çêtirin ji bo pêwendiyên cinsî tê ditin. Bûk, bi pejrîrandina her du aliyên, ji aliyê siwarîna tê revandin û anîn heta mala merivên zavê. Em neyên xapandin, jin di jîna rojane ya kurdî de roleke ne piçûk dilîze; ew ruyê xwe nagire û bi awakî aktif beşdar dibe bûyerên civakî. Heta di nav tevgerên nîstîmanî yê veşartî de ji xuya ye ku gotina jinan heye.



Halabca

Di dirêjayiya van heşt salên dawîn, ku tê de serrê Iran û Iraqê fireh bû, de nûçeyên vê navçeyê pir car ber bi plana duyemîn hatin avêtin. U hevkarîyên ku di navbera dewletên şerker û partiyên kurd ku dijî rejîma dijminên wan têkoşînê dikin hatin imza kirin de meydana şetrencê ya navçeyê hin bêtir tev li hev kir. Lê, li gel vê qasê, pîrsa kurdî bi tevayîya xwe vekirî dimîne. Trajêdiya Halabçê û encamên (netîce) wê li vîra ne ji bo ku vê rastiyê binin bira me.

Bê gûman, emê tucar jîmara rast a qurbanan nizanibin, lê ew bi hezaran bûn ku li wê derê jîna xwe hişt.

Du rojan piştî êrişê, Partiya Yekîti Nîstîmanî, bi rîya serokê xwe Mîrza Talabani ku di serdana (ziyaret) Londonê de bû, bangeki şand hemî cihanê ji bo alîkarîyê.

Médecins Sans Frontières tavil pêşneyar kir ku heyeteke lénêrinê, ku bi xwe re 300 kg dermanên pêwistiyên yekemîn bibê, bişîne wê derê.

Heyeta tibbî ku ji Dr Jacques De Milliano (MSF-Hollanda), Dr Réginald Morrels (MSF-Beljik) û Mîrza Dirk Dons, ji laboratorîya toksikolojî ya Zanîngeha Gent (Prof. Heyndrickx) di 23 Adar de ji Brukselê diçe Tehranê.

Di 25 Adar de, ew diçin eniyê, bajarê Halabçê û gundê Anabê, û li wê derê gelek nimûne ji bo tahlîkirinê distînin.

Rojên paştir ji bo serdana kesên ku nexweşxaneyên navçeyê tije kirine tîna veqetandin. Ev ji bo nûnerên me derbeke mezin e, nemaze ku ew xwe bijîjkên rojavayî yê tenê, ku çûne wê derê, dibînin.

Sehadeta wan gelek giran e û bê tu gûman îsbat dîke ku çekên şîmik bi awakî gelek fireh dijî sivilan hatin bi kar anîn.

Şehadet

Li ber giraniya rewşê, em biryar distînin ku operasyonê pêk binin ji bo şandina dermanên taybetî (xusûsî)

ku ji bo birîndarên van çekan bi kar tînin. Berê şandina heyetê, civîneke çapê tê çekirin, û tê de rêxistina me, ji bo cara yekemîn di dîroka xwe de, bê nezalalî, bikarîna çekên şîmik mahkûm dîke.

Stendina biryara me zor bû, ji bo ku me zanî bû ku ev celeb şehadet, eger bêalî be jî, dikarî bû ji aliyê yek ji şerkeran bi awakî fireh, ji bo propagandaya xwe, bi kar bê. Lê, bi zelalî xuya bû ku em diviyên bi bilindî û xurtî tîstên ku me ditin bêjin û tu gûman li ser rastiyê bûyeran nehêlin.

Heyeteke din Brukselê di yekê Nîsanê de berda û, piştî çend rojan, sê ton derman teslim kirin bijîjkên îrani ku birîndaran derman dikirin. Ev şandina dermanan, ku beşeke mezin ji perê wan ji aliyê hikûmetên Beljik û Luksemburgê hat dayîn, baş hat ditin û hişt ku em pêwendiyên baş bi berpirsiyarên Iranê re bikin. Dermanîna din, piştî çend rojan, hatin şandin, weka her gav tevî êkîpeke tibbî.

Ev heyet, di vegerê de, ji me re da zanîn ku li Başûrê

Rojava yê Iranê bi hezaran penaberên (multecî) kurd ên Iraqê hene.

Ji bo ku piraniya wan ji navçeyên gazkiri bûn, ew diviyan ku çiyayê xwe berdî ji bo ku bîlez bigihêjin zewiyê Iranê.

Penaber

Komisyona Bilind ya Penaberan ya Neteweyên Yekbûyî ji me re hevpeyvînekê bi karbidestekî (memûr) bilind ê irani yê Wezareta karên hundir pêk ani. Em gelek şas bûn gava ku wî zû pejiwand ku MSF xebatekê ji bo van penaberên ku di gelek kampan de, di dirêjayiya sinora Iraq û Iranê de, hatine civandin bike.

Ji me re demeke hinêk dirêj diviya bû ji bo ku em ji desthilatan (otorite) re bidin têgihajtin ku em naxwazin piştgiriya bernama wan ji bo penaberan bikin bê ku ekipên me bixwe li cihê kar bin. Piştî ku me vê astenga dawîn rakir, destûr ji min re hat dayîn ku ez biçim wilaye-

ta Kurdistan û Azerbaycana Rojava, bi hogiriya berpirsiyarên netewî û yên HCR (Komisyona Bilind a Penaberan).

Me di dawiyê de dizani ku Komara Islami bi van hezaran Kurdên Iraqê çî kiriye, û me baş dizani ku ew heyet rengdêreke (sifet) wê ya istisnai, di welatekî ku tê de rêxistinên ne fermî (resmî) tu gotina wan tu neye de, hebû.

Di dêkoreke sihri ya çiyayên hişk û golên şîn de, em bi pêşewaziya (istikbal) baş a desthilatan û ya gelheya Kurdên Iranê, ji bo alikariya van penaberan, şas man.

Rêxistina irani ku bi pêkanîna kampan xerik (mijûl) dibû di çend rojan de pêwistiyên bingehî dabîn (temin) kirin (kon, ava vexwarinê, xwarin, battaniye, pêkanîna idarî û hwd.). Jin di nav vê gelheya ku hin di bin derba bûyeran de bû û ku hestê (his) wê yê perîşaniyê gelek kûr bû de hêdî hêdî ji nuh de pêk dibû.

Merivê biêş

Piştî vê serdanê, Waliyê Azerbaycana Rojava pêşneyar kir ku çend ekipên MSF di gundên Piransar û Serdeşt de, ku tê de heşt kamp hene, bîn bi cih kirin.

Gelek kes vê projeyê napejirin, ji bo ku Iran ne layiqa piştgiriya me ye.

Ev tistekî vekirî ye ku xebata me ji bo piştgiriya kesên ku, netewahiya (cinsiyet) wan yan welatê ku ew tê de ne çî be, ji bo wan alikariyêke tibbî pêwist e ye.

Ji Irani yan Iraqî dûrtir, em dixwazin alikariya merivê ku dêşe bikin.

Ev mantiq bixwe ye ku, ji derveyî her tehlil yan hesasiyetêke rêzani (siyasi), di hêla ku em bi xurtî bikaranîna çekên şimik mahkûm bikin (adiditina bikaranîna vê celeba çekên şimik li meydana serr tehlikeke gelek rast e, û divê ku em diji wê agahdar bin) û ji bo alikariya hêja ku gelheyên irani ji bo pêşewaziya penaberên kurd ên Iraqê dikin li çepikan bixin.



Kurd di têkoşîna duhu û sibe de

Ş. B. Sorêkî

Gotinek heye, dibêje :
Bûyerên diroki xwe pirrcar dikin. Hin merov û netewe ji bûyerên dirokê fêri dersan dibin û tevdearan çêdikin, ku di ducarkirina bûyereke dirokê de bêtarên carekê li serên wan qewimîne xwe ducar nekin. Lê hindêk merov û netewe ji hene, yên ji dest wan nayê der tevdearan bikin, ji dirokê nikarin fêri dersan bibin, loma rasteçep sille li rûyên wan dikevin û bi ducarkirina bûyereke dirokê re bêtarên tîyên serên wan ji ducar dibin, lê pirr caran bi sêweyêke ji berê bêtir.

Ji ber ku gelê Kurd di diroka nêzik de ne xwedan dewleteke serbixwe bûye, bo vî gelî bingehên rêzaniyê bi sêweyêke zanyari nikaribûne werin danin. Serhildanên Kurdan hêza xwe ji sêri bêtir ji dil girtine, ev ji ne weqa xirab e, lê tiştê xirab ew e, ku tevdear û planên wan ji ne ji sêri, lê ji dil hatine der,

loma qe bi ser neketine.

Di pirtûkên diroka nûjen ya welatên Ereban de, dema di derheqê serhildaneke wan de tê nivisandin bi rûpelan pesna wê serhildanê dibê û zaroyê dixwîne digihê baweriyekê, ku ev serhildana êdi bi serketiye, lê dû heyecan û bikarhanina peyvokên pesnê, di rûpela dawîn de peyva bê oxir 'Lê' bi nişkan ve tê holê, hemî tiştên di rûpelên pêşin de dide hêlekê û heqiqeta tahl dide zarok (wek : ... êriş kişandin ser dijmin, bi sedan ji wan kujtin, bi sedan dil girtin û li herderê bi hezaran xelkê me pişt wan girtin û têkoşeran xwe berdane bajêr û ala me rabû jor, ... lê gihistina hêzeke dijmin ji paytextê welêt, hindikbûn û kevinbûna çekan û xayintiya filan kesi bû sedema şikestina serhildanê, ...). Ev 'Lê'ya tenê bo netewên perîşan û bêçare di dirokê de dikare pirrcar bibe.



Di destpêka sedsala 20an de, ji ber ku di nav Kurdan de hejmareke layiq ji rêzan û akadêmikên niştimanperwer tunebûne, fersendên gellek hêja ji dest netewa Kurd filitine û çêkirina welatekî bi dewlet bo Kurdan nikaribûye di hebûnê keve. Dû kutabûna Şerê Cîhani yê Duwem rêxistin û partiyan Kurdan, yên kêmezêde sêwenû, wek Partiya Demokrat ya Kurdî, hêdi hêdi hatine holê. Di navbera 1960 û 1985an de hejmara rêxistin û partiyan xwe bilind kir. Ewên van rêxistinanan damezirandin, bê guman bi pirraniya xwe, kesên fidakar bûn û ji gelê xwe hej dikirin, lê mixabî ji dest tunebûna bingehên rêzaniyêke kurde niştimanperwer, ku bikaribe ji rêxistinekê re bibe him, berpirsiyarên rêxistinên nû di derheqê rêberî, birêvebirin û nivisarên xwe de ta radeyêke pirr bilind razêke (teqlid) rêxistinên Ereb û Tirkan kirin û dûvre xwe ta stuyên xwe di demagojiya marksizmê de nimandin, teoriya marksizmê, bi zanibûn, an bê zanibûn, ji xwe re kirin qulpek, bêyi ku bikaribin ev teoriya kompleks li goreyi realizma gel û welatê xwe analiz (tehlil) bikin û bêyi kirina hesabekî ji faktorên "geopolitik" yên hevêrkê re. Ancam ne tenê ji dûre-

hevûdinbûna rêxistin û gel bû, lê herweha ew bû, ku partiyên mezin, ya rast, seroketiya partiyên mezin neçar diman pirr caran di pratîkê de ji teoriya partiyê bi dûr kevin. Tecrûbeyê bi rehmeti Mustefayê Barzani hê li ber çavan e û dikare li vir weke nişeyekê were dayin. Rêxnerkirina şexsan gelleki hêsan e. Hin merovên Kurd bi rehmeti Barzani, tev hemî fidakariya wî sûcdar dardixin, lê xweziya mesele bi vê hêsaniyê bûya. Rasti ew e, ku idyolojiya partiyê sedema her tiştî bû.

Di ew demên, ku endamên şoreşekê derbeyên mezin li dijmin dixin de teoriya xwe didê hêlekê û ji bo sedemên atifi gel bi pirraniya xwe pişt wê şoreşê digire, lê tiştê herî grîng ew e, ku gel di rojên xirab yê şoreşê de pişt serdarên wê şoreşê bigire. Piştgirtineke wisa ji dikare tenê were holê, ger serdariya şoreşê bikaribe gelê xwe fêhm bike û ji gel derkeve. Eger gelê Kurd li pirraniya hêlên Kurdistanê ji ber bindestiya xwe, xwe negihandibe radeyekê bo bikaribe seroketiya şoreşekê bizê, pêwîst e seroketiya şoreşekê ku bi navê wî gelî diaxîfe bikaribe wî gelî têbigihîne û têgihandina gelekî ne bi sloganan e, ne bi çêkirina şevên Newrozê li Ewropa û ne ji nivîsandina belavokên rotinî ye. Têgihandina gelekî divê li ser himên rastiyê, realîzmê, dirok û rewşa welatekî û ber her tiştî, bi amadebûna gel were holê. Ta nuha têgihandineke wisa nehatiye holê li Kurdistanê.

Dem çareka dawin ya sedsala 20n e. Hêke merov



bi şeweyekê objektîv, bi serê xwe, ne bi dilê xwe, bi hawaki realist rewşa iroj ya netewa Kurd bide ber çavan, ti guman naminin, ku ew rewşa yeke pirre xirab e (belê ew li hin beşan ji ya ber 20 salan baştir e, lê xwebêj ne ew e, ku rewş yek e baş e). Gelê Kurd bi pirraniya xwe hê nizane bi zimanê xwe bixwêne, dezgehêke radyoye bi zimanê Kurdî tune, ku di eynî demê de xwe bigihîne guhên Kurdên hemî beşên welêt û rêxistin û partiyên Kurdan hê iroj ji pirraniya weşanên xwe bi zimanên Tirkî, Erebi, yan Farisî çap dikin, û pirraniya van nivîsan ne nivîsarên objektîf in, bêtir yên rotin û demagojiyê ne. Gellek merovên me hê teneqihîstine, ku rewşa Kurd û Kurdistanê yeke bi serê xwe ye, ango yek nikare bibêje, ku di şoreşa Rûsya, yan Cezayir, yan Kûba, yan Filistinê de wisa bû, loma em ji dikarin wek wan bikin. Rewşa Kurdistanê di cihanê de yeke taybetî û pirre dijwar û tevlihev e, ji ber wê ji idyolojiyêke bi serê xwe divêt, idyolojiyêke ku bikaribe ji heqê tîstan derkeve û layiqî doza Kurd ya nemaze be (xwebêja vê gotinê ne ew e, ku em ji tecrûbe û

şasîtiyên yên din dersan negirin). Li milê din, divêt partiyên Kurdan dû daxbûnên gelê Kurd yên sedsalan êdi têbigihên ku ew şasîtiyêke pirre mezine, dema rêxistineke Kurdan pişt xwe bi welatekî ku bi xwe dagirkerê Kurdistan e grêde. Erê, xwe grêdana bi yekî ji van dewletan re ji neçariyê (mêbûri) ye, lê zû-dêrêng, wêk tecrûbeyên dirokê didin zanin, zirara vê xwegrêdanê ê karê wê bêtir be. Tenê ger ev rêxistina Kurd ji wî dewleti xasûktir û zanatir be, belkî ji wê rêxistinê re ta demekê xwegrêdanêke wisa bi sût be. Ta roja iroj tiştêki wisa hê ne li sûtê netewa Kurd, ne ji li sûtê partiyekî xwegrêdayî bûye (bê guman hin rêxistin ê peyva 'xwegrêdan' nepejirinin. Peyva hevaltî, yan yeke din ê werin bi karhanin, lê mixabin pratîkê baş xuya kiriye, ku peyva 'xwegrêdan' ya rast e).

Li vir, û tevî tiştên di derheqê gelê Kurd de hatin gotin, divêt were gotin, ku gelê Kurd herdem hazir e bo rizgarkirini Kurdistan hemî fidakari bika. Milleti Kurd ji hemî hêzekani siyasî waqîitir e. Bo ev millet rewşenbir divên, ku wî şaş nekin, wî goreyi waqî Kurdistan û

daxwazi ew millet pêşva bibin. Ev gotina ya Şêx Ezeddin Husênî ye (hevpeyvîneke tev bernama Kurdî, ya Radyo 2 EA, Sydney, IX, 88). Di eyni hevpeyvînê de Şêx Ezeddin dide zanin, ku daxwaza gelê Kurd herdem serxwebûna Kurdistanê bûye û vi geli tu caran negotiye, ku ev bes, yan ew bes divêt rizgar bibe, lê wî rizgarbûna hemî Kurdistanê xuya kiriye. Şêx Ezeddin herweha xuya dike, ku "mefhûmî xudmuxtari", yanê daxwaza otonomî, di nivê sedsala 20an de ketiye ferhengê Kurdî û divêt ev bêjeya ji ferhengê rabe; ku dû təcûbeya çend salan ew xwaztina otonomî bo gelê Kurd bi zirar dibîne. "Yan divêt ev millet bo rizgarkirini Kurdistan şer bika, yan li malê xu rûne, ..." dibêje Şêx Ezeddin.

Nuha em werin pîrsa dê-magojiyê û avêtina şemşaqan ji Yeketiya Sovyêt re. Cawa gundiyeke bi can û bêhn hewl dida, bo axayê xwe ji gundiyeke din bêtir razi bike, da ew wî û ne yekî din bike wêkilê xwe, xuya ye hin partiyên Kurdan ji ev rola standine, ku belkî Yeketiya Sovyêt ruxsetê bide yê herî "şirhelal" bo bibe partiya Komonist ya Kurdistan, lê yeketiya Sovyêt, ne tenê bi mêjiyê xwe diponije, ew herweha di dil de ti hest bo Kurdistan tune. Ev ji ne xirabiya Yeketiya Sovyêt e, lê bêçarebûn, nezanti û li-paşmayina Kurdan e (ta iroj Yeketiya Sovyêt hê rê nedaye, ku partiyekî komonisti Kurdistan hebe).

Serok û berpirsiyarên rêxistinên Kurdistanê bi xwe ji dizanin, ku siyaseta cihanê êdî hatiye guhertine, ku mar-

ksizm bi xwe ji nuha ketiye qonaxêke (merheleyeke) nû. Tev vê ji şeweyên rêzaniya wan, bi taybeti şeweya nivîsarên di rojname û belavokên wan de nehatine guhertine. Encama vê ew e, ku nîfsê nû, ciwanên bi siyaseta Kurdî mijûl, ew ji, ne tenê şas tîyên terbiya kirin, lê herweha di derheqê pratika rêzaniya cihana iroj de li paş diminin û bêyî bizanibin tîyên xapandin. Wisa bêtarên li ser netewa Kurd li şûna ku kêmbibin, heku diherin bêtir dibin û serpehatiyên dirokê yên xeddar xwe duçar û dehcar dikin.

Wa ye peymanê aşitiyê dû şerê heşt salan di navbera Iran û Iraqê de tîye imzakerîne, lê tîstê mat ew e, ku li cihanê ne rojnameyek, ne raporeke radyo, ne ji yeke tîlvîzyonê behsa Kurdan dikê ye, gerr di quncikekî de behsa wan bibe ji, wêk leşkerên xwefros (mercenariyê) tît kirin. Li milê din, yek ji şertên yekem yê herdu dewletan ew e, ku ew "Kurdên hevûdin li dij hev bi kar neynin" (Rojnameya Sydney Morning Herald, r. 9, 11/8/1988). Belê, wêk Berêz Celal Talbanî dibêje (hevpeyvîneke tev Bernama Kurdî, Radyo 2EA, Sydney :

VIII, 1988), rewşa Kurdistanê pîrr zehmet e, hêzên cihanê yên gewrê li dijî guhertina xeriteya cihana iroj in, welatên cihani bo mesleheta xwe naxazin iroj pişt Kurdan bigirin, û gellek gelş û astengên din ji hene; lê merov neçar dibe bipirse, ma gelo çawa hêzên Kurdistanê Iraqê peymanekê tev Cumhûriyeta Islami imze dikin û tev wan dibin heval, bêyî ku di peymanê de bikin şert, ger rojekê imzakerina peymanekê aşitiyê tev Iraqê hebe, divêt ew ji tîde besdar bin ?!!!

Siyaset û şeweyên ku ji hêla partiyên Kurdan de ta iroj hatine bikarhanîn divêt werin guhertin : Ger partiyên Kurdistanê, bi taybeti ewên di şer de, naxwazin xwûna gelê Kurd ji vir û şûnve bê sîd birije, welatê Kurdan bê amancine bi kerk bisewite, pêwîst e stratêjiyêke bi ser û binê xwe ve nû di rêxistinên wan de were holê.

Parti û rêxistinên Kurdan divêt :

* Li xwe rexneyan bigirin û bi şeweyêke objektîv li bersi-



va vè pirsê bigerin : Cima ta iroj rewşa gelê Kurd weqa xirab maye (û çima partiya di pirsê de nikaribûye rewşê weqa ji berê bastir bike);

* Şaşetiyên hatinî kirin bipejirinin û wan ducar nekîn;

* Nîfsên iroj û sibê bi terbiyake realîste niştimanperwêre, welatparêz û pêşverû xwedî bikin û ramana yeketiya gelê Kurd û welatê wî li nik wan avdîn;

* Xwe û gelê xwe nexapînin;

* Ramanên ji serên wan mezintir li şûn bihêlin û lingên xwe qasî berra xwe drêj kin;

* Dest ji dêmagojiya kevnesalan û razek-kirinê (teqlîd) berdînin û xwe bigihînin siyaseta cihanê ya iroj;

* Gorên hevûdin nekolin,

* Xwe di nav gel kin, gel fêri xwendinê kin, adetên xirab ji nav gel rakin û bibin beşek ji gel (yan na, bila bi navê gel neaxifin);

* Kurd û Kurdistanê di pratikê de bikin amanca yekem.

Ta nuha têkoşina gelê Kurd wek trimbêlêke di qûmê de ketibe ûksê ye, kêmezêde di şûna xwe de batanaj dikêye. Yekcaran hebki pêşve diçe, lê ba û bahoz û hoqîsa li pêş wê disa li şûna berê vedigerînin. Kes nîzane xurîst ê kengê ba û bahozê rawestîne, baranê bi ser wî erdî de bibarîne, gihê li ser qûmê kesik bike û rêya hoqîsê hişk bike. Dibe ku ev şertana qe ji neyên ! Loma pêwîst e di ev trimbêla ketî korta qûmê

de guhertinên mezin werin holê. Motora wê divêt were nûjenkirin, lastikên goreyî sertê qûmê pêwîst e werin siwarkirin, şofêrên wê divêt xwe fêri ajotina nav qûmê û hilperikandina hoqîsan ke, û siwarên di trimbêlê de divêt herdem hisyar bin, da bikarîbin, ger hewce kir, xwe zû ji trimbêlê bavêjin û wê serbijorê gêrkin, bo paşve vengere. Tenê wisa, trimbêl û rêwîyan dikarin xwe bigihînin şênahiyê.

Divêt em xaniyê xwe li ser himên ku bapîrên me kolayê ji nû ve û goreyî rewşa iroj lêkin. Divêt em xwe biguherînin û nû bikin.

(IX-88)



Jinên kurd li Kobanî, deşta Sirûcê, Kurdistanê Sûriyê

Şaşî : Nedi û Danestan

Di hejmara buhuri de, me çirokeke xeyali ya Şahinê Sorekli, Nedi û Danestan, di rûpel 20-23 de weşandi bû. Mixabin, di her du stûnên pêşin ên rûpela 21 de tevliheviyeke mezin çêbû. Em ji bo vê yekê ji nivîskar û xwendevanan buhurandina me hêvî dikin û li jêr van stûnan, anga "bûn, ku Şerif Paşaki tîstek li ser mafê me ji hebe", rast dikin :

dêrdiketîne, yê n ku şaş û mat dikirîne şêr û piling û di çavên wan de yar û neyar li hev dixistin, heta yekcaran şêr li pêş çavê şêr dibûye rûvî û rûvî dibûye şêr. Dûvre ji nav devên rovi û çêqelan keleboxêke gewravîn dêrdiketîye, ku herweha navê SUPER, anga : SUPERKELEBOX, lê bûye, û ew ji rovi û çêqelan ji xwe re dikirîye. Wisa ji şêr û piling bû bûne bindestên rovi û çêqelan. De êdî nizanîm ger pêwendîya çiroka şêr û pilingên Nediyan û vê çirokê bi hev re hebin, yan na. Lê ez serê kurdalê xwe neêşînim; em di sa vegerin serê Beran û Meraqê.

Me got serê heyst salan ê rawestîya. Peymana aştiyê, ronahiya çavên pîrika xwe, ê li bajarêki welatêki Arova bihata îmze kirin, lê wek hercar Nediyan di sa pîrr dabûn, lê tîstek nestandibûn. Tevî ku yek ji grîngtiriyên sedema serê herdu welatan li ser Nediyan û welatê wan bû ji, ne paşaki wan, ne axeyek, û ne ji serpartiyeki wan li ser maseya imzakirina peymana aştiyê hebû, û ji ber ku, wek min ji sêrinê xwe re got, Nedi û Danestan yek ji sedemên serê Beran û Meraqê bûn, yek ji bendên yekem yê n peymana aştiyê ji ew bû, ku karbidestên herdu welatan Nediyan hev li dij hev bi kar neynin.

Lê Nedi weqa bêçare ji nebûn, delalê pîrika xwe. Ji wan hejmareke ne biçûk li welatên Arova dijîn. De êdî hejmara rast kesek nizane. Di hin pirtûkan de 50.000 e, di hinan de 500.000 e, di hin arşivan de nizimtir e, di hinan de bilintir e. De van camêran û çêjînan pîrr aciz bûn, ku şerif Paşaki wan ji li pas quncikêki maseya peymana aştiyê ê rûnenîsta, loma bûn pizot û ji rêxistinên xwe xweztin ku tîstek were kirin. Berpîrsiyarên rêxistinên Nediyan, wan mêrxasan, otobês girtin, û çawa bo sevên roja xwe ya netewî, ku bi navê Nûro, yan Nêwro, yan Niro dihate binavkirin, merov li hev dicivandin û dihanîn sevên xwe, wisa ji kes û nekesên xwe li hev civandin û bi sedan otobêsan berên xwe dane ew bajarê Arovi, li kuderê peymana aştiyê ê bihata îmze kirin. Berpîrsiyarên rêxistinên Nediyan, weqa fidakar, zana û dilpak bûn, ku di cih de li hev kirin, ku hewceya sloganên cuda û alên partîyan bo vê munasebetê nake. Ew ê, 9.000-10.000 ji wan, tev li meydana bajêr bisekiniyana û bi dengêki bangkirîna: Em ji hene ! U ji ber ku em hene, divêt di peymana aştî de tîstek li ser mafê me ji hebe.

Dîroka Kurdistanê di

- XVI -

VI- Zargotin û bêje (2)

2- Dêma nuh

Dawiya şerrê cihanê yê yekemin ji bêjeya (edebiyat) kurdî re vejyanêke ku hîn ji dewam dike da. U ev ji bi saya gelek rojname û kovarên ku izn da nivîskarên cuhan ku helbestên xwe biweşînin û ramanên (fîkr) xwe yên netewî û civaki pêşan bidin (li infra, Presse binêre).


Gelek zor e ku meriv helbestvanên vê nûjeniyê ku ji 1920 heta rojên me dajo bibijêre.

Di çîrisina ronakbiri ya Silêmaniyê, paytexta rast a Kurdistanê Iraqê, de em berê herkesî Pîremêrd (1863-1950), navê derewîn ê Hacı Tewfîq, bijmêrin. Bira (fîkr) wî taybetî bû, xebatkêrêkî newestiyayî, rojnamevanekî ku salên dawîn ên jîna xwe da bûn nasandina xweşîkbûna welêt, zimên, dîrok û bêjeya kurdî bo cuhanên kurd ku jê gelek hez dikir. Bêkesê gelek hesas, Faiq Abdallah (1905-48), bê rawestan cuhanan han didan (teşwîq dikir), xebat û xwendinê, hezkirina welêt û qoncbûnê

li ba wan geş dikir. Ziwer, Abdallah Mihemed (1875-1948), ku tije lirizm û hesasiyet bû xwêder (tebîet) û xaka (erd) netewî distiran.

Goran, Abdallah Sulêman (1904-63), yek ji mezintirin helbestvanên kurd ên îroyin bû. Wî teşeyên (awa) qalibkiri û weznê klassik berdan, ji bo ku ew aligir û çêkerê şewaneyên (beyt) serbest bû, û herweha ew aligirê serbestiya ramanan û jinê bû ji; helbestvanê birên pêşkêti, wî bi awakî lirik kêmasiyên civakî rexne diki-

rin. Qani', Mihemed Sêx Abdul Kerîm (di 1900 de çêbû), ji 1951 heta 1955 gelek pirtûkokên ku her yek ji wan aliyekî ji Kurdistanê ku wî bi gelek evîn pêşan dida nişan dida weşandin. Ji helbestvanên kurd ên Iraqê, em Ehmed Muxtar Caf (1897-1935; weşana Silêmaniyê, 1960), Hamdi (1878-1936, weşana Bexdayê 1958) û yên cuhan-tir, Abdul Wahid Nûri (1903-44), Dildar (1918-48, Dîwan, weşana Hewlêr 1962) û Dilzar ku di 1920 de çêbû bû û ku di 1957 de Carikên Baba Tahir ê sedsa-



(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981. Wêgerandin; fransîzî-kurdî : Pervin

Ansîklopêdiya Islamê de (*)

la Xlmin ku hin Kurd weka helbestvanê xwe hesab dikin, nişan bidin.

Li Iranê, di dema Komara Mehabadê de, du helbestvanên cuhan ên niştimanperwer xuya bûn : M. Hêmin û bi taybeti Abd El-Rahman Hejar (di 1920 de çêbû) ku helbestvanê fermî (resmî) bû û ku bi hezaran şewane, ji bo stirana evina welêt û azadiyê, weka Alekok (Teb-riz 1945) weşandin; di 1958 de, wi diwana çirokên bi şewane û komêdiya Beiti seremer û lasayi sag û mangesew weşandin; û wi kurteya jinenigariya xwe (rûpel 142-85) û hin helbestan (185-222), di Kurdskiy dialekt Mukri ya K. R. Eyyûbi û I. A. Smirnova, Leningrad 1968 de, û wergerandineke Carikên Xeyyam (Bêrût 1968) weşandin.

Bi kurmanci, meriv dikare Kamuran A. Bedir Xan, xwediyê şewaneyên serbest û romantik, û nemaze Cegerxwin, Sêxmûs Hesên (di 1903 de çêbû), xwediyê du diwanan : Diwanê Cegerxwin (Sam 1945) û Sewra Azadi (Sam 1954) bijimêre; Cegerxwin helbestvanekî gelek germ û welatparêz bû. Wi xwendina cuhanan, yekbûna hemî Kurdan dixwestin, û ji hestê (hiss) xurt ê niştimanperweriyê dûrtir diçû û rêformên civakî yên radikal daxwaz dikirin; şewaneyên wî yên gelejmar, ku teşeyên wan cihê ne, awayê wan

Dr. CELILÊ CELİL

JIYANA REWŞENBÎRÎ

Û

SİYASÎ YA KURDAN

(Di Dawiya Sedsala 19'a û

Destpêka Sedsala 20'a de)



JINA NÛ

piricar klassik e, lê ew dizane teknikên nûjentir ji bi kar bîne. Qafiyên wan gelek dewlemend in. Ew ji aliyê Kurdên Sûriye û Tirkiyê gelek naskirî û hezkirî ye (li Ordixanê Celil, Poêziya Cegerxwin bajarvaniyê, Erivan 1966 binêre).

Lê nuhbûna mezin di jindariya bêjeya kurdi ya Ermenistana sovyetî de, ku ew ji bi zaravê kurmanci ye, ye. Yên ku pêşengên vî wari bûn piraniya wan Yezidiyên kevn bûn. Ew nexwenda, derhatiyên Tirkiyê, ku dizani bûn ji rewşa xwe ya civakî ya nuh kelk bigirin (istifade bikin), bûn. Bê tu çandêke misilman û bê tu pêwendî bi ronakbîrên cihana kurdi ya din re, berhemên wan piricar li ser rîya îdêolojîyê ne, lê teşeya wan gelek tebiitir e. Ew ahenga klassik nas nakin, û şewaneyên wan sade

ne. Lirizm tê de kême. Ew evina malbat û delaliya xwederê distirên, weka Casimê Celil (di 1908 de bûye) û nemaze Mixailê Resid (di 1925 de bûye) ku hesasiyeta wi dewlemend e. Hin ji helbestên wan ên gelek rêzani (siyasi) ilhama wan civakî ye. Divê ku jin azad bibe, dibêje Etarê Şero (di 1906 de bûye), di gelek çarîkan de. Usivê Beko (di 1909 de bûye) rexneya mêtîngehiya derebekî (fêodal) dike; Qaçaxê Murad (di 1914 de bûye) û Wezirê Nadirî (1911-47) yan Eminê Evdal (1906-64) hez dikin ku demên qehremanî yên şerrê azadiyê binin biran. Em Heciyê Cindî (di 1908 de bûye) û Sement Siyabend (di 1908 de bûye), qehremanê Yekitiya Sovyetî, ku teşeyêke nuh li destana xweş a lirik a geleri Siyabend û Xecê, 1959, kir, bijimêrin. Ma-



دال

- حیرۆکه تیر -

شیرکۆ بیکهس

١٩٨٧

moste Karlanê Caçani, yê cuhantir, nemaze fablên lawiran ên gelek teze weşandin. Rojnama Riya Taze ya Erivanê û diwanên cihê, ji derveyî gelek namilkeyên (broşur) piçûk, van helbestvanên kurd ên Ermenistana sovyeti, ku hemî bi zargotina xwe ya dewlemend tije ne, didin nasin.

Bi rasti, bitenê ji 1920 pêşe (nê helbest) di bêjeya kurdî de xuya bû. Ji bo firehkirina ufuqa ronakbiri û dewlemendkirina takaneyê (tevayiya gotinên zimên), bi nûjenkirina wê, ronakbirên kurd berhemên niviskarên biyani - ji kêmayî ve perçeyên wan - wergerandin. Li Sûriye û Lubnanê, wan ji fransîzi, li Iraqê ji ingilîzi û erebî, li Iranê ji farîsi, li Ermenistana sovyeti ji rûsî û nemaze ji ermenî wergerandin. Bi vi awayî trajêdiyên Shakespeare, The Tempest, ji aliyê Cemal Nebez (Bexda 1957); çirokên Voltaire, Zadig, ji aliyê Moh. Elî Kurdi (Bexda 1954); rûpelên Victor Hugo, Gavroche; yên

Daudet, les Etoiles; yan ên Anatole France, ji aliyê Zaza, ji xwendevanê kurd re hatin pêşkes kirin. J. Nebez ji Le Manteau de Gogol (Bexda, 1958) wergerand. Lê nemaze ew Kurdên sovyeti ne ku wergerên niviskarên rûs : Pûşkin, Gorki, Tolstoï yan Lermontov, bê ku em Lenin û Stalin ji bir bikin, û ermenî ne : Abovian, Tumanian, Isahakian û hwd. Navên sereke yên wergerên ku em rasti wan tên ev in : C. Celil, H. Cindî, E. Evdal, Q. Murad, N. Esed, T. Murad. Hin ji hin ji berhemên xwe rast bi rast bi ermenî dinivîsin, weka C. Celil, E. Evdal, Nadoyê Xido Mehmûdov û gelekên din.

Li Iraqê, gelek niviskarên nasandina zanyari (ilmî) hatin wergerandin, weka Dr. Hasim Dixirmaci, Naci Ebas, mutexessîsê wergerandina çirokên rêwiyên ingilîz ên kevn li Kurdistanê.

Di warê bêjeya safî de, çirok beşa ku bêtirin li zihniyet û hunera kurdî tê

ye. Di kovara Hawar de, meriv dikare çirokên Nûredîn Zaza (di 1919 de bûye), û fablên bi pêşe yên Mistefa Ehmed Botî bixwîne. Di van çirokan de, Qedri Can (di 1918 de bûye) xwe ji passîfizma olî û karîna (îktidar) derebêki dûr dixê. Lê em bi awakî taybetî Osman Sebri (di 1906 de bûye), ku carna helbestvan e, lê ku nemaze çirokvanekî rast e û ku stilê wî jîndar, sade û rast e, bijimêrin.

Li Iraqê, ku tê de ronakbir bêtir in, dirok bi Huseyn Huznî Mukriyanî (1886-47) yê dewlemend û xwediyê lêhûrnêrinên cihê warekî bi-jarte ye : Diroka miriyên kurdî, 1929-1931; Kurdên navdar, 131; Mirên Soran, 1935; Kurd û Nadir Sah, 1934; Kurdên Zend, 1934; Kurdistanê mukriyanî yan Atropatêne, 1938, û hwd. General Mihemed Emîn Zekî (1880-1948), Kurtêya Diroka Kurd û Kurdistanê, 1931; Diroka Dewlet û Miriyên kurdî di dema îslamî de, 1948; Diroka Silêmanî û qezayê wê, 1939 û du cildên Navdarên kurd yan ên Kurdistanê, 1945-7. Hemî ev berhem bo erebî hatin wergerandin. Refîq Hilmi (1961), dest bi weşandina Biraninên xwe kir. Ji 1956, wî ew di pirtûkokên sed rûpelî de weşandin û navên wan kirin : Biranin. Kurdistanê Basûr. Soreşên Şêx Mahmûd (ev xebat temam ne bû). Tewfîq Wehbi, pêşengê rêzimana kurdî, 1929, 1956, dirokzanekî ku li ser Yezidiyan, 1962, rayên (esl) Kurdan û zimanê wan lêgerînan kiriye, 1965, e ji.

Rexneya bêjeyî bi Yûnis Resûl yan Dildar, Kamuran û nemaze Marûf Xiznedar ku,

di gotarên kovaran yan pêsgotinên diwanan de, gelek helbestvanên kevn yan nûjen pêşkeş kirine, dest pê dike. Xiznedar, ji derveyî Dîroka bêjeya kurdi, Keş û qafiyet le şî'iri kurdi da (Rhyme and Rhythm in Kurdish poetry, Bexda 1962) ji nivîsî. Cemîl Bendi Rojbeyani, wergerê erebi yê Şerefname di 1957 de, xwe nêmazê li ser helbestvan û nivîskarên Zengene, Kelhûr û êlên hawsêyên (ciran) wan xwar kir. Eladîn Sicadî ne bitenê Dîroka bêjeya kurdi (di 1952 de), Lêgerin li ser bêjeya kurdi (1968) û Nirxê Zanîne (1970), lê pênc cildên Gerdaniya inciyan (1957-72), ku diwanekê çirokên bêjeyî, kurteçirok, kênokiyên ku tê de felsefê, ol, dirok tev li hev dibin e, û Gerr li Kurdistanê (1958) ji weşandin. Em di dawiyê de Izz El-dîn Rasûl (di 1935 de bûye), ji bo xebata wî li ser bêje û zargotinê (1968), bijimêrin.

Li Ermenistana sovyetî meriv rasti rexnekêrên bêjeyî yên cuhan ku di Riya Taze de ditinên xwe yên ku li ser berhemên helbestî ku

derdikevin piricar hişk in ji têt. Ji wan, Mixailê Reşid û nemaze Emêrikê Serdar. Ordixanê Celil rexnekereki gelek hêja ye. Pirtûkên wî li ser Cegerxwin, Dimdim, pêsgotiyên, û gotarên wî li ser zargotinê vê yekê isbat dikin; wî Helbest (1954) û Teli Hamza, celebeke destan (1963) ji weşandin. Lê pêşevanên wan ji helbestvanan kêmtir in. Ew tucar di meydana xeyalê de û di ya dirokê bixwe de ji naçin; lê piraniya nivîsên wan jina belêngaz ku ew ji berê, di dema Tirkan de, dijiyan û vejyana rewşa wan a civakî ya îroyîn pêşan didin. Di serî de, giregirê wan, û dewlemendtirê wan jî, Ereb Semo (di 1898 de bûye) têt. Di diwana wî ya dawîn de, Berevok (Erivan 1969), metnê Berbang (1958), nivîsa duyemîn a Şivanê kurd (1935) ku ji nuh de xwend û rast kir heyê. Şivanê kurd ji nuh de li Beyrûtê hat wergerandin û weşandin. Wî têt de bi awakî gelek taze û sade jina xwe ya zarokiyê ya şivanê piçûk, bûyerên xwesên jina êlan û ketina komunîzmê nav wan pêşan dan; Jina bextewar (1959) û

Hopo ku ne hatiye weşandin û ku ragihana wê ye, têt de jina Kurdan di bin rejîma sovyetî de hatiye wasf kirin. Semo Dimdim jî (1966), ku çiroka romankirî ya destana navdar e, weşand. U ew nivîskarê gelek gotarên li ser hemî babetên civakî yan diroki ku bala Kurdan dikişînin, û ku di gelek rojnamên bi zimanê rûsî de derketine, ye jî. Eli Eydal-Rehman, di van xerîkbûnên (mijûlbûn) civakî bixwe de, Xatê Xanim (1956) û Gundê Mêrxasan (1968) weşandin; û Rehîm Gazî Hîşyarbûn (1960) ku têt de li ser liberxwedana Kurdên Iranê diji zorkêrên wan ên Tirk yan Iranî têt peyivîn weşand. Meriv, bi vî awayî, dibîne ku romana rast, weka ku em li Rojavayê têt digihêjin wê, hin bi rastî di bêjeya kurdi de tu nêye. Nivîskarên kurd, heta li Iraqê jî, celeba çirokê çêtir digirin (terçih dikin). Em vê nişankê bixwe jî bo sanogeriyê (tyatro) jî dikin. Li Ermenistanê, ji destpêkê, hin tecrube bi W. Nadirî, Reva jinê (1935) û A. Mirazî, Zemanê çuyî (1945), û di nêzik de, Ismailê Duko, Zewaca bê dil (1964) re çêbûn. Di hemî van rewşan de, diviya ku diji adetên kevnar têt kosîn bê kirin. Li Iraqê jî, Burkan, Kiç û qutêbxane (Keç û xwendegeh) (1956); Jiri, Afret û niwiste (Jin û nivîst) (1956), sanoyên ku di xwendegehan de dihatin liztin. Rexne jî di faslên komik ên sanogeriya Emin Mirza Kerim de hebûn. Di 1953-4 de, Goran di rojnama Jin de çend perçeyên şewane, weka Xewna xizan, Dengê mirî û hwd., ku amanca wan jî kêmasiyên civakî îroyîn derxinin meydana bû, weşandin. Lê Cargorî (1959) ya Xalid Delair

PANDA

Ahmet CANTEKÎN



• Weşanên HAYKURD •

şanoyeke niştimanpêrweri ye. Cemal Abdul Qadir, Baba Norûz (1960), şanoyeke ji pênc pişkan (fasl) weşand. U Zeki Ehmed Hênari, Qederê zordar Dahak (1960) weşand. Em nemaze Birina reş a Mûsa Anter (di 1920 de bûye) pêşan bidin, ji bo ku ew li Stembolê hatiye weşandin, tê de niviskar xizani û nezanîya gundiyê kurd ê Tirkîyê nişan dide. Li ser şanogeriya kurdi li Azad Kardo, The Kurdish Stage, di The Kurdish Journal, 11/3-4 (1965), 13-5 de binêre.

Cavkani

Eladin Sicadi, Mijo-i edebî kurdi, Bexda 1371/1952; Marûf Xiznedar, Oçerk istorii sobremennoy kurdscoy literaturi, Moskov 1967; Izz El-Din Rasûl, El-waki'iyya fil-edeb el-kurdi, Seyda-Beyrût 1967; Celadet Bedir Xan, Klasikên me an şahir û edibên me ên kevin, di Hawar, 33 (Ciri 1941), 522-30 de; Th. Bois, Coup d'oeil sur la littérature kurde, di Machriq, XLIX (1955), 201-39 de; niviskar bixwe, les Kurdes : Dîrok, Civakzani, Bêje, Zargotin û hwd., LIII (1959), 101-27, 266-99; niviskar bixwe, Bulletin raisonné d'études kurdes, berhem bixwe, LVIII (1964), 527-70; Emin Fêwzi, Encumen Ediban-i kurd, Stembol 1920; Eli Kemal Bapir, Guldeste-i şî'ra-i haw'esrim, Silêmani, 1939; Abdal Kerim Hekezî, Komela şî'ir-u şa'iran-i kurdi, Bexda 1938; Refîq Hilmi, Şî'ir û edebiyat-i kurdi, Bexda, I, 1941, II, 1956; Kerim Şareza, Koye û Sa'irani, Bexda 1961; Abd El-

Selam Hilmi û Abd El-Mejid Lutfi, Nazarat fil edeb el-kurdi, Bexda 1945; Marûf Xiznedar, Aghani Kurdistan, Bexda 1956; Casimê Celil, E'frandnê nvisk'arê kôrmanca sovetiê, Erivan 1948; niviskar bixwe, Niviskar'arê kôrmanca sovetiê, Erivan 1954; niviskar bixwe, Niviskar'arê k'ordayê sovetiê, Erivan 1957; Kaçaxê Murad û C. Celil, Efrandinê nvisk'arêd k'ordêd Ermenistanêye sovetiê, Erivan 1961.

C- Weşana kurdi

Kartêkirina (tesir) weşanê di jina netewî û çandî ya gelekî de bingehî ye. Di vê babetê de, pêşveçûn û guhertinên weşana kurdi pêşveçûna rêzani (siyasi) ya Kurdan nişan didin. Ji 119 rojname yan kovarên ku hatine jimartin û ku bi awaki gelek muntazam dernakevin, hin hene ku jina wan kurt e. Navendên weşanê ji Stembolê çûn bajarên Iraqê yên cihê : Bexda, Silêmani, Hewlêr, Kerkûk; yên Iranê : Tehran, Mehabad, Tebriz; yan Şam û Beyrûtê.

Piricar, ev rojname bi du zimanan in. Piraniya kovaran kaniyêke gelek dewlemend ku zaninan li ser ziman, zargotin, adetên welatê kurdi, dîrok yan coxrafya wi didê ava dikin. Meriv hin ji tê de gelek metnên helbestvanên kevn û nuh û ditinên baş ên rexneya bêjeyî dibîne. niviskarên cuhan ji xwe tê de digihinin.

Rojnameya kurdi ya yekemîn, Kurdistan, li Qahirê, di 1898 de, ji aliyê Midhet Paşa Bedir Xan û birayê wî Abd El-Rahman, hat ava kirin. Ev rojname ji Qahirê çû Genev û Folkstonê (31 hejmar); pasê ji nuh de li Bexdayê, di 1977 de, ji aliyê Kemal Fuad hat weşandin. Li Stembolê, rojname mehane Roja kurd ku pasê bû Hewtawê kurd di 1912 de derket (3 hejmar). Di 1916 de, Sureya Bedir Xan bi tirkî rojname hefteyî Jin ku "Kurdistan ji Kurdan re" ilan dikir şand. Wê di 1917-8 de ji rojname hefteyî Kurdistan (37 hejmar) weşand.

Di nav her du şerran de (1920-45), weşana kurdi bi rasti xurt dibe. Li Silêmani,

بروڤسور
راروکان باقیع

جولانه وهی زنگارخوارانهی کورد
له خهباتیدا بۆ سه ره بخۆنی
نه ته وایه تی و سیاسی

مێژوولاموز
گهوه به گهوهی

di 1920-2 de, Pêskewtin (118 hejmar) derdikeve; di 1922-3 de, Roj-i Kurdistan (15 hejmar), û ew li Bexdayê di 1973 de ji aliyê Cemel Xiznedar ji nuh de tê weşandin; kovarên hefteyi Bangê Kurdistan, 1922 (14 hejmar), Bangê Heq, 1923, rojnama fermî ya Şêx Mehmed (3 hejmar) û Umîdî Istiqlal (25 hejmar) ku ji aliyê Refîq Hilmi tê nivîsin. Di 1925-6 de, Diyarî Kurdistan a Salih Zeki Sahibqan, bi kurdi, erebî û tirki 16 hejmarên wê hebûn. Di 1924-6 de, rojnama hefteyi Jiyane (56 hejmar), rojnama fermî ku pasê navê wê bû Jiyân, 1926-38 (556 hejmar) û Jin 1939-63, di bin idareta Pîremêrd de heta mirina wî (1950), hejmarên wê ji hezar bêtir bûn. Di 1938 de, kovara zanyarî Zanîstî ya Salih Quftan ku wî tê de bendên (meqalê) diroki û bêjeyî weşandin, lê hejmarên wê kêm bûn; lê rojnama hefteyi Ziban, 1937-9, ku ji aliyê şaredariyê (belediyê) dihat weşandin 70 hejmarên wê hebûn. Li Rewandîzê, Huseyn Huzni Mukriyanî ji 1926 heta 1932 Zari kurmançî ku nêzîkî 30 hejmarên wê hebûn weşand. Bexda, bi weşandina kovarên mehane yên gelek dewlemend, Gelawêj, 1939-49, di bin idareta Ibrahim Ehmed de, û Dengê Getî-ê Taza ku ji aliyê balyozxana Ingilistanê dihat weşandin û di bin idareta Tewfiq Wehbi de bû, bû navendeke çandî ya kurdi ya gelek girîng.

Li derveyî Iraqê, girîng e ku em kovarên gelek girîng, ên bi tipên latîni, Hawar, 1932-5 û 1941-3, 57 hejmar û ragihana wê ya biwêne, Ronahî, 1941-5, 28 hejmar, ku her du ji li Samê

ji aliyê Mir Celadet Bedir Xan dihatin weşandin, û kovara hefteyi Roja nû, 1943-6, 73 hejmar û ragihana wê Stêr ku bitenê 3 hejmarên wê hebûn, ku ji aliyê Mir Kamuran Bedir Xan li Beyrûte dihatin weşandin, nişan bidin. Ev kovar girseyeke (kitle) gelek mezin a belgêyên zargotîni didin.

Li Erivanê, rojnama niv-hefteyi, Riya Taze, organa beşa kurdi ya Partiya Komunist a Ermenistanê, ku ji 1930 heta 1938 (612 hejmar) bi tipên latîni derket, pasê ji 1955 heta nuha bi tipên kirilîk hat weşandin. Nuha, hejmarên wê ji 2500 bêtir bûne. Ev rojnâme, tevî Jin a Silêmanî, nişeya xwesiktirîn a dirêjbûna temenê (imr) weşana kurdi ye.

Rewşa rêzani ya nevekîrî li Iranê, di navbera salên 1941 û 1946 de, nemaze pîstî ilankirîna komara kurdi ya serbixwe (1945-6), bû sedema bişkivbûna weşaneke kurdi ya dewlemend li Mehabadê : Kurdistan, 1945-6, rojnama fermî (113 hejmar) û kovareke bêjeyî di

bin eynî navî de (16 hejmar). Hawarê Niştîman, Awar, Gir û Galî Mindalani kurdi, Helale, bihareke tenê dit. Ji aliyê xwe, li Lahicanê, Şêx Latîf, lawê Şêx Mehmed, kovara Niştîman ku 3 hejmarên wê hebûn, weşand.

Pîstî serr, û heta ilankirîna komara Iraqê (14 Tîrmeh 1958), kovar bi kurdi û erebî derdikevin. Di 1948-9 de, li Bexdayê, Eladîn Sicadî Nîzar (22 hejmar), û di 1957-63 de, Hafîz Mistefa Qazî li Bexdayê Hêwa (36 hejmar) diweşîne. Li Hewlêrê, ji 1954 heta 1960, Gêw Mukriyanî kovara niv-mehî Hetaw, ku 188 hejmarên wê hebûn, weşand. Di bin Komarê de, li Kerkûkê, 1959-62, Ray Gêl (34 hejmar) û Azadî, organa Partiya Komunist a Iraqê (56 hejmar) derketin. Li Silêmanî, Yekîtiya mamosteyan kovara mehane Bîlêse, 1959-60, 10 hejmar, diweşîne. Di 1960 de, Rojî nuwe, 18 hejmar, û rojnama rojane ya komunist a rêzani û bêjeyî, Birwa, ji Tîrmeh 1960 heta Cîle 1963 95 hejmar derxistin. Li Bexdayê, rojnama duzimani



دەست
خەبات عارف

Xebat, organa P.D.K. 462 hejmar di 1959-61 de derxistin. Wezareta Karên Candi ji 1959 heta 1966, bi erebî û kurdi Careser kirdini kîşt û kal (21 hejmar) û Wezareta Gihandinê Iraqi nuwe (24 hejmar) weşand. Di nav sala 1960 de, avukat Omer Celal Huwaizi 69 hejmar ji rojnama rêzani ya demokrat Dengê kurd weşand. Meriv nikare Kurdistan, rojnama hefteyî, ku li Tehranê, di bin himayeta hikûmeta irani de ji Gulana 1959 heta Gulana 1963, bi 205 hejmaran hat weşandin nebêje. Ev rojnameya gelek balkêş, ku rêzani, zanyari, bêjeyî û civaki bû, bitenê li derve hat belav kirin.

Serrê xwini yê kurdi-iraqi, ji 9 Ilon 1961 heta 13 Adar 1970, xebata çapemenî ya kurdi kêmkir. Lê li Hewlêrê, şaredariyê rojnama xwe Hewlêr (1962-63), bi 76 hejmaran, weşand. Li Bexdayê, di 1964 de, hejmarê kurdi ya yekemîn a kovara demî Tutin ji aliyê sazandeyê (idarêta) tûtîn û, di 1967 de, Birayeti, rojnama rêzani ya Salîh Yûsîfî, hatin weşandin. Di vê demê de ye ku li Tirkîyê, bi tirkî û kurdi, hin kovarên demkurt derketin : Dicle û Firat (1962-63) li Stembolê, bi 8 hejmaran; Deng, di 1963 de û Dengê Taze ku bitenê 4 hejmarên wê hebûn di 1966 de. Ev kovar tavil hatin rawestandî û mudirên wan hatin taqîb kirin.

Dawiya serrê li Kurdistanê, ji 1970 heta 1973, bû sedema derketina 29 rojname û kovarên ku 2 ji wan li Kerkûkê, 6 li Hewlêrê, bitenê 4 li Silêmani, lê 16 li Bexdayê. Ev xuya dide ku paytexta iraqî di wê demê

de bû bû navenda ronakbiri û çandî ya Kurdên Iraqê. Li Silêmani, Birayeti (1971-2, 18 hejmar); Deng-i Mamos-ta (7 hejmar); Jin, ji 1971, weka dewambûna rojnameya ku ji aliyê Pîremêrd hati bû ava kirin dibe; ji 1972, kovara mehane Estêre, ji bo zarokan. Li Bexdayê, Birayeti, ragihana rojnama Ta'axi (1970-1, 18 hejmar). Ji 1970, kluba pûlbervekeran Gêti-i Pûl bi erebî, kurdi û ingilizi diweşîne. Yekitiya Gîstî ya Sendikan organa wê ya fermî Hisyar-i kirêkaran, ji hejmara 189 a Kanûn 1972, beşeke wê ya kurdi heye. Weka weşanêke salane, The Journal of the Kurdish Academy, 1/1 (1973), cildêki stûr ji 800 rûpelan ku berpirsiyarê weşana wê Ihsan Şîrzad, wezîrê Şaredariyan, e û ku beşeke wî bi erebî ye. Li Iranê, navê Rêga-i Yekiti, kovareke mehane ya hikûmeta Iranê, ku hejmara wê ya yekemîn di Nisan 1971 de derket û ku hin ji bi awakî muntazam derdikeve (di 1978 de) hat ditin.

Komelên kurdi yê cihê li derve bultenên temenkurt ku carna bitenê daktîlokîrî ne diweşînin. Di 1949 de, bi fransîzî, Dengê Kurdistan, organa P.D.K. li Ewropayê. Ji 1958, Komela Xwendekarên Kurd li Ewropayê her sal bi ingilizi Kurdistan, bi kurdi û bi tipên latîni çend hejmarên salane yê Hêviya Welêt di 1963-5 de, û Ciya di 1965-7 de weşandin. Encu-



mena (komîsyon) pêşketina Kurdistanê ÇAK a Ingilistanê bi ingilizi hejmareke tenê ji Kurdîca weşand. Cardin bi ingilizi, yek ji çêtirîn weşanên ji vi celebî : The Kurdish Journal, ji Kanûn 1963 heta Ilon 1969, ji aliyê Komela Xwendekarên Kurd li Amerikayê derket. Li dawiyê, bi kurdi û tirkî, Ronahi, organa Kurdên Tirkîyê li Ewropayê, ji Tebax 1971. Di 1978 de, hejmara wê ya 8min derket.

Cavkanî

Cavkaniyên Edmonds û MacKenzie; R. Lescot, La presse kurde, di Roja nû, N° 1, Gulana 1943 de; Bishop M. L. Ryan, Bibliography of the Kurdish Press, di JRCAS, 1944, 313-4 de; Sicadi, Mejo-i ..., 551-7; Nêrewan, Notes sur la presse kurde d'Irak. Publication d'un hebdomadaire kurde en Iran, di Orient, X (1959:2), 139-48 de; I. C. Vanly, le Kurdistan irakien ..., 394-5; û nemaze Cemal Xiznedar, Kurdish Journalism Guide, bi kurdi, erebî û ingilizi, Wezareta Candê, Bexda 1973, ku bi hinceta (munasebet) rabe-riyêke çapa kurdi, ji bo 75 saliya rojnama kurdi ya yekemîn, hat weşandin.

(Th. Bois)

Dawî

Rêzimana Kurdî

(Zaravê Kurmancî)

- XVI -

Mir Celadet Bedir Xan û Roger Lescot (*)

VII. Pronavê kesin (1)

131. Di pronavê kesin de sê kes, du zayend (cins) û du jimar hene. Ew weka nav tê tewandin.-

a) Pronavê kesin di awayê kirdeyi de	
Nêr û Mêya yekejmar	Nêr û Mêya gelejmar
Ez	Em
Tu	Hon (hûn)
Ew	Ew
b) Pronavê kesin di awayê têrkerî de	
Yekejmar	Gelejmar
Min	Me
Te	We
We	Ewan, wan

Nişank. Pronavê kesin ê kesê duyemîn ê gelejmar, di hin peyvikan de, teşeyên (awa) wî ên kevnar hene : Hingî (dêlva hon ku nemaze li Behdînanê bi kar tê), hewe (dêlva we, nemaze li

Botanê).

132. Bikaranîna pronavên kesin

Bi awakî gîstî, pronavê

kesê sîyemîn jî bo, di hevokê (cumle) de, cihstendina her navêkî ku meriv naxwaze dûbare (tekrar) bike bi kar tê.

Pronavê kesin ê kirdeyi

(*) Grammaire kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergêrandin : Pervin

(1) Di vi pişki (fasl) de, emê bitenê li ser pronavên kesin, pronavê birdar û pronavê hevduditiyê hûr binêrin. Pişkekî paşin ewê li ser pronavên pêşker be.

weka kirdeya lêkerên pêgerandî (yên ku têrker nastinin) di hemî deman de û weka kirdeya lêkerên sergerandî (yên ku têrker distinin) di demên tofa siyemin de bi kar tê (li bend 142 binêre).

Nîşe :

Ez tēm (hatin, lêkera pêgerandi).

Ez hatim (hatin, pêgerandi).
Ez dibînim (dîtin, lêkera sergerandi).

Di awayê têrkerî de, pronavê kesin ji bo kesandina lêkerên sergerandi di demên du tofên (kom) yekemin de bi kêr tê (li bend 185 binêre).

Nîşe :

Min dit (dîtin, sergerandi).
We dit (dîtin, sergerandi).

Cardin di awayê têrkerî de, ew rola têrker, di eynî mercên (şert) navên ku ve tewandina awayî distinin de, dilîze.

Nîşe :

Tu min dibini.
Ji bona te.

Nîşank. Ev nîşandanên kurt li ser bikaranîna pronavên kesin ewê di pîşkên (fasl) li ser Lêkera Sergerandi û Pevhatina Lêker de dirêjtir bibin.

133. Pronavê kesin di awayê têrkerî de rola pronavê destdaniyê dilîze. Ji bo ku meriv bêje hespê min, hespê te, û hwd. meriv pareka destnîşandanê yan ya nebinavkirinê ya di rewşa avakirî de digihîne nav, li gora zayend (cins) û jimara

wî, û pronavê ku di awayê têrkerî de ye dixê dî wî.

Nîşe

Hespê min (te, wî, wê, me, we, wan).

Hespên min (te, wî, wê, me, we, wan).

Mehîna min (te, wî, wê, me, we, wan).

Mehînên min (te, wî, wê, me, we, wan).

Bi gotinên ku bi pareka nebinavkirinê hatine ragihandin, em avahiyên jêrîn dibinin :

Hespeki min (te, wî, wê, me, we, wan).

Hespîne min (te, wî, wê, me, we, wan).

Mehîneke min (te, wî, wê, me, we, wan).

Mehînine min (te, wî, wê, me, we, wan).

134. Pronavê ê

Di kesê siyemin ê yekemî de, û di awayê têrkerî de, pronavê kesin teşeyê wî ya kurt ê, ji bo her du zayendan, ku bitenê di awayên jêrîn de dikare bi kar bê, heye :

a) Têrkera kifsdaniyê ku bi lêkerê rast bi rast hatiye anin.

Nîşe :

Min got ê, dêlva min got wî (yan wê).

Ez didim ê, dêlva ez didim wî (yan wê).

Min da ê, dêlva min da wî (yan wê).

Weka ku nişeyên jorin nişan didin, ê bi neçari (icbarî) tê pîştî lêkera ku ew girêdayî wê ye. Ew dikare di nivîsinê de xwê ragihîne gotina ku tê pêşiya wî. Ev awayê bikaranînê ji berê bêtir dibe.

Nîşe : Min gotê.

b) Têrkera kifsdaniyê ku bi daçekê hatiye anin. Ew, wê gavê, hevgerîna jêrîn tîne :


Pê yan vê (dêlva bi wî, bi wê).

Jê (dêlva ji wî, ji wê).

Lê (dêlva li wî, li wê).

Tê (dêlva di wî, di wê).

Nîşe : Tê re



Weka ku emê li durtir bibinin (Pişk XXII), hemî van teşeyên hevgirti bi daçekên cihê bi kar tên.

Nîşe :

Jê re, dêlva ji wî re, ji wê re.
Pê re, dêlva bi wî re, bi wê re.

Di dawiyê de, hevgirtinên pê yan vê, jê, lê, tê dibin pêşdani.

Nîşank : ê dikare ji bo cihstendina pronavên pêşker ên yekejmar ên têrkêrî, vî, vê (ji ev), wî û wê (ji ew), di eynî erkan (wazîfe) de, ji bi kêr bê.

135. Pronavê kesin ê birdar

Di kurdi de pronaveki kesin ê birdar, xwê, heye. Ew ji bo her sê kesên her du zayendan û her du jimarên dibe. Ji bo ku ew hergav erkê têrkêr dike, xwê tucar naguhêre.

Xwê bi awakî neçari cihê her pronavê ku dema ku weka têrkêr di nav hevokê de bi kar tê dibe nûnerê kirdeyî, eger eva dawîn bi awakî vekiri yan ne vekiri bê nîşan dan, distine.

Ango, xwê dikare weka têrkêra gerandî (direkt) yan negerandî (endirekt), yan ji

weka têrkêra nav (destdani) bi kar bê.

136. Bikaranîna xwê weka têrkêra lêker

Xwê, bi awakî wêkhev, lê neçari, cihê hemî pronavên kesin, di hemî erkên wan ên têrkêrên lêker de, her dema ku evên dawîn divên - eger bikaranîna wan bê pejrandin - bibin nûnerên kirde yan tevayiya kirdeyên hevokê, distine. Bi awakî din, meriv xwê bi qasî têrkêra lêker a ku bi fransîzî bi : moi-même, toi-même, lui-même, elle-même, soi-même, nous-mêmes tê wergerandin bi kar tîne.

Bikaranîna pronavên tebîî	Bikaranîna "xwê"
Ez te dibînim (kirde : ez, kesê 1min; têrkêr: te, kesê duyemîn).	Ez xwê dibînim (kirde û têrkêr : kesê 1min ê yekejmar).
Ew te dibîne (kirde : ew, kesê 3min ê yekejmar; têrkêr : te, kesê 2min ê yekejmar).	Tu xwê dibîni (kirde û têrkêr : kesê 2min ê yekejmar).
Ew wî dibîne (kirde û têrkêr : kesê 3min ê yekejmar, lê her yek ji wan kesekî din nîşan dide).	Ew xwê dibîne (kirde û têrkêr : kesê 3min ê yekejmar, her du ji eynî kesî nîşan didin).
Hon me dibînin (kirde : kesê 2min ê gelejmar; têrkêr : kesê 1min ê gelejmar).	Em xwê dibînin (kirde û têrkêr : kesê 1min ê gelejmar).
Emê ji we re goşt bikirin.	Honê ji xwê re goşt bikirin.
Ew masê li ber wan datînin (kirde û têrkêr: kesê 3min ê gelejmar, lê ku kesên cihê nîşan didin).	Ew masê li ber xwê datînin (kirde û têrkêr : kesê 3min ê gelejmar, ku eynî kesên nîşan didin).-

Lêkerên ku di nîşeyên buhuri de xuya dibin hemî lêkerên sergerandî yên ku bo demên tofa siyemîn hatine kesandin in. Bi demên her du tofên yekemîn, rêzikên (qaidê) bikaranîna xwê eynî dimînin : Me xwê êşand. Min xwê dit. We ji xwê re goşt kirî, û hwd.

Nîşank I. Emê li durtir bibinin ku xwê gelek caran ji bo avakirina lêkerên birdar bi kar tê.

Nîşe : Xwê dirêj kirin. Xwê lêzandin, û hwd.

Nîşank II. Dema ku xwê gelejmarekê nîşan dide, lê-

kerên sergerandî yên dema buhuri ku ew têrkêrê wan e hergav yekejmar dimînin, eger kirdeya wan xuya be. Di vajayê wê de, eger eva dawîn ne xuya be, pêvhatin bi awayê gelejmar dibe. Nîşe : Wan bila sebeb (bê sebeb) xwê aciz kir. Bila sebeb xwê aciz kirin.

Dûmahî heye

H e l e b ç e

Amed

Geleki bindest,
Dixwazi bibi serbest,
Pišta xwe bi xwe bibest,
Ramangelêr, ne ramanperest.
* * *

Helebçe !
Berî te,
Cavên me tiji xuli,
Guhên wan tiji herî.
Pişti te,
Cavên me tiji xwin,
Guhên wan tiji mil (1).

Tu dibêji :
- kuro, ne wilo ye.
Dilê xwe fire ke,
Matiryalizmê bixwîne,
Li dinê dêr ke.
Ez ê Helebçe bibîrim, bêjim :

- çengkutan e ! (2)
Tu dibêji :
- kuro, ne wergî ye.
"Dinya azad"
"Xaka mafên mirovan"
Demokrasiya birciwazî"
Tu pê ne yî razî ?
Tu çi jî me dixwazî ?
- yek kete navê û got :
Cima vî herdu serî firot ?
Ez ê Helebçe bibîrim û bêjim :
- çengkutan e !

* * *

Geleki bindest,
Dixwazi bibi serbest,
Pišta xwe bi xwe bibest,
Ramangelêr, ne ramanperest.
* * *

Pişti Helebçe,
Kûzê e'ybê,
Kûzê xwexapandinê,
Bi rê ve,
Bû perçe perçe.
Helebçe,
Demokrasi,
Demokrasiya stêrkê,
Mûyek lê nine, bê pirç e.

(1) mil : qûm, herî û celba li ber derya û çema.

(2) çengkutan : jî çengê hatiye. Cenga dikute : gotinên bê wata û vala dike.

Seri şilf tazi.
Rûmet çû,
Li ber tif û xwazi.
Pû "demokrasi"

* * *

Geleki bindest,
Dixwazi bibi serbest,
Pişt a xwe bi xwe bibest,
Ramangelêr, ne ramanperest.

* * *

Demokrasi !
Van dewletên bi kespik
Wan dewletên bi xirxirk,
Tu kirinê kedanê,
Li stoyê xwe badanê,
Bi te gel girêdanê.
Helebçe û demokrasi,
Na binim mina zoyê dildara,
Li kêleka hev,
Li ba hev,
Li hev.

* * *

Win ne bi xêr hatin, Mévanino !
Demokrasiya birciwazi,
Pêşverûti,
Li Konferansa Navnetewî,
Konferansa çekên kimawî.
We got û got.
Yeki kirri, yeki firot.
Bijîşkê bê sinor
Pû kire herdu seri, got :
- Konferansa Navnetewî,
Rûreşiya navnetewî,
Bextreşiya navnetewî.
Kurdên reben,
Ez zanim
Cawa hatin gazkirin.
Dewletên beşdarên
Konferansa navnetewî,
Çi çep, çi rast,
Hemî xwe kerr kirin.

* * *

Geleki bindest,
Dixwazi bibi serbest,
Pişt a xwe bi xwe bibest,
Ramangelêr, ne ramanperest.

* * *

Helebçe ! Helebçe !
Berketî nine.
Kesek ne berketiyê te.
Kêşe siwarbûn e,
Hemî siwarên te.

* * *

X e b a t a m e

5 Kanûn 1988

Civineke çapê li navenda çapê ya bajarê Namur, Centre des Rencontres, tevî Liga Beljîki ji bo Parastina Mafên Mirovî - Saxa Namur-û Navenda Candî ya Derhatiyên Namur. Amanca vê civinê ilankirina şeva agahdariyê li ser nijadkujîya Halabca ku me piştî çend rojan, di 13 Kanûn de, pêk ani bû. Ev civin bi awakî gelek fireh di televîzyon, radyo û rojnameyên Namur de hat weşandin.

9 Kanûn

Endamek ji Têkoşer di televîzyona Namur de nêzîkî saetekê li ser pîrsa kurdi peyivî.

13 Kanûn

Seva agahdariyê li ser Halabca û pîrsa kurdi. Nûnera Têkoşer, serokê Liga Mafên Mirovî yê Namur, André Marie Servais, û sênatorekê kevn û dostê Kurdan, Jean-Emile Humblet, dût û dirêj li ser Kurd û Kurdistanê peyivîn. Piştî, filma belgeyî ya li ser nijadkujîya Halabca hat nişan dan. Di dawiyê de, beşdarî bi pîrsên xwe yê giring balkêşiyêke mezin pêşan da û pirtûk û belgeyên kurdi kirin.

20 Kanûn

26

Cardin, di çarçeva kampanya xwe ji bo Halabca de, me eynî şeva agahdariyê li bajarê Liège, bi alîkariya rêxistina Mouvement Chrétien Pour la Paix, pêk ani. Ji derveyî nûnera Têkoşer, Jean Pascal Zanders, pisporê (mutexassis) çekên şîmik peyivî.

13-15 Cile 1989

Konfêransa Kurdi li Stokholmê. Ev civin ji aliyê Federasyona Komelên Kurd li Swêdê, li ser pîrsên Kurdên Ewropa, hati bû pêk anin. Nêzîkî 200 kes beşdarti wê bûn. Konfêrans, hem ji aliyê naverokê û hem ji aliyê pêkanîyê, gelek hêja bû. Li rûpel 5 binere.

10 Cile

Seva agahdariyê li ser Halabca li bajarê flaman

Heuzden-Zolder. Ji derveyî nûnerê Têkoşer, rojnamevanê beljîki Marc Hoogstijns ku nuh ji Kurdistanê Iranê vegeriya bû filma gerra xwe nişan da. Ev filma hêja di televîzyona beljîki de hat pêşan dan û di rojnameyan de li ser vê serdanê (ziyaret) dût û dirêj hat nivîsîn. Televîzyonên Ewropî yê din ji vê filmê xwest.

22 Sibat

Me filma Halabca li bajarê La Louvière, bi alîkariya rêxistina giring Pax Christi nişan da.

25 Sibat

Rêxistina flaman Mala Aşitîyê şevêke mezin li ser Kurdan, li bajarê Aalst, pêk ani. Parlementerê Ewropî Willy Kuypers û 3 nûnerên Têkoşer dût û dirêj li ser



HUWECO

POLITOLOGISCH SYMPOSIUM
DE BELGISCHE BELEIDSVORMING
INZAKE CHEMISCHE WAPENS

Zaterdag 18 maart 1989



AU MENU

Cuisine de tous les continents
plats chauds et froids



pirsa kurdi axaft. Pişti pirs û bersivan, koma Têkoşer a folklorê û xwarinên kurdi dilê beşdarên tije şahî kir.

8 Adar

Civîneke çapê li Têkoşer bi hinceta sersaliya nijadkujiya Halabca û şandina 2 milyon frênkên beljîkî ji aliyê hikûmeta Beljîka bo Kurdistanê. Li rûpel 4 binêre.

11-19 Adar

Foire du Livre. Ev raberiya mezin a navnetewî ya pirtûkan her sal li Brukselê, li Centre International Rogier, pêk dibe. Bi sed hezaran meriv tîr serdana wê. Têkoşer, tevî gelek rêxistinên din ên ku ji aliyê Wezareta Candê alîkari distinin, beşdarî wê bû.

18 Adar

Endamek ji Têkoşer beşdar bû seminereke rêzani (siyasi) li ser afirandin û bikaranîna çekên şimik. Ev roj ji aliyê rêxistina Huweco li bajarê Antwerpen (Anvers) pêk bû. Gelek pispor û parlamenterên cihê li ser vê pirsê peyivin.

18 Adar

Endamek ji Têkoşer beşdar bû seminera Mrax, Rêxistina diji Nijadparêziyê, li ser pirsê penaberan (multeci).

22 Adar

Newroza Iraniyan ku ji aliyê komiteke penaberên irani hat pêk anin. Me stran û dilanên kurdi pêşkes kirin.

24 Adar

Cardin Newroza Iraniyan

ku ji aliyê komiteke din a penaberên irani pêk bû bû. Em bi folklorê kurdi beşdarî wê bûn.

24 Adar

Seveke agahdariyê li ser diroka Kurdistanê û ya Newrozê ji aliyê Partiya Komunist a Yekbûyî ya Tirkîyê hat pêk anin. Têkoşer ji bo axaftinê hati bû vewwendin (dawet kirin). Me ji heval Ihsan Aksoy vewwend ku were bipeyive. Wi axaftineke dirêj û gelek heja li ser diroka Kurdistanê û rêzayê (mana) Newrozê kir. Pişti wî, Mirza Zeki Kiliç, ji komita navendî ya vê partiye, tehlila rêzana partiya xwe li ser pirsê kurdi kir. Pişti pirs û bersivan, me filmeke belgeyî li ser diroka şoreşa Kurdi li Kurdistanê Iraqê "Dengê Kurdistanê" pêşan da û pirtûkên kurdi firotin.

